

**Hwsa Dîyarbekirê
Çîroka 16 mehên hewsê**



Enver Kohensal

Sal 1365ê hicrî bû kongra 7ê ya hizba demokrata kurdistanê îranê birêve çobû û gelek gorankarî û guherînên bingehîn çêbibûn û biryarên bicî di rêxistinên hizbê de hatibûn girtin. Komîsyonên teşkîlat û pêşmerge bûne komîsyona sîyasî - nizamî.

Biryarên kongirê şorr bûne nav rêxistinên hemû deverên kurdistanê, alugorr nav çend komîte û hêzên nizamîye hizbê de pêkhat. Komîta urmîye û ararat û hêzên girêdayî bi wan komîta ku sê hêzên şehîd Niho, şehîd Hatem û şehîd Ebasî bûn, bûne melbend û navê wê melbenda şomal û berpîrsê wê jî cangorî Elî Kaşifi xebatkarê naskirî yê şomala kurdistanê bû.

Haluhevayê kongirê rêxistina nû wisa kiribû ku em bi mural û motîvek baş hatine menteqa xebatê (1365 rojî).

Biryar û rêxistina taze cevab dabû karên me xweştir û revantir bibûn em bi xelkê xwe re ketin danustanê rêxistinê û karê sîyasî nizamî kultûrî civakî û

Çawa ku min anî ziman rêxistina nû bi başî cevab dabû çon wê salê me emelîyatên baş birêve birin deskevtên baş bi dest anîn û derbên giran li dujmin dabûn û tûşî zerer û zîyanên mezin kiribûn. Şerê nav bajarê şino, girtina paygaha gundê mîrawa li teniştê şino, girtina paygaha mîrdavûd, girtina paygaha melûne(biradost) girtina paygaha zengeka (kinarberoj) paygaha gundê sipîdere (şipîran) dest bi ser de girtina

gurdana kûra jêrî (enzel) paygaha asingiran (biradost_gelîyê berdereş) û hin emelîyatên din ku renga bi tamamî bîra mide nemabin.

Bêgoman ew deskevtên mezin bê qurbanî bidest nehatin. 18ê heyva sê ya wê salê li gewrîya zîniyê de di şer û pevçonekê de gel caş û pastarên rijîmê, sê mêrxas û egîd bi navên 1. Ehmed Qasimî xelkê gundê nêrgi (mirgewer) 2. Mahir Ebdî xelkê gundê jareva (mirgewer) 3. Selah Mecîdîfer xelkê gundê filkan (mirgewer) canê şîrîn û pîroze xwe gorî xaka pîroz û gelê kurdistanê kirin tevî refên nemiran bûn.

Li payîza heman salê di kemînekê de ku ji aliyê kirêgirtî û xwefiroşên rêjîmê ve li ser pira gundê mensûrava (mirgewer) hatibû danîn mixabin du qehreman du xurtên taze pêgihîştî binavên 1. Mikaîl Qehremanî xelkê gundê sorkan (mirgewer) 2. Elî Xanemîrî naskirî bi Elî Şikak xelkê gundê mensûrava (mirgewer) tevî karwanê nemir û cangorîyên kurd û kurdistanê bûn.

Paygaha zengeka roja 1365/06/18 ji aliyê hêzên çelenge pêşmerge ve hatibû biser de girtin roja paştir 1365/06/19 dema em li qerexa gundê Golegenî derbas dibûn ketne kemîna dujmin ku ji caş û pastaran pêkhatibû, mixabin pêşmergeyek çeleng û mêrxas binavê Heyder Axazade şehîd ket û canê xwe yê ezîz fedayî xaka pîroz û doza gelê xwe kir û hevaleyê jî birîndar bû.

Cangorî Heyder hevaleyê xudan tecrube, nermuhelîn ser hemdê xwe dev bi ken û rûxweş bû ez û ew gelek li hev nêzîk û dost bûn û çî carî li bîra min naçe.

Wira de hemû wan cangorî û hevalên qedir giran bi rêzdarî bi bîr tînim bejna xwe ber fedakarî û ezemeta wan diçemînim û soz didim heta ku li jîyanê de mabim ser rêya wan doza wan bimeşim û wefadr bimînim bi rihê wan yê pîroz, serê gelê me û malbatên wan saxusilamet be.

Hevalên delal ew pişka ku zêdetir weke bilanço (guzarişa şerr) bû bo muqedeme û çawanîya girtina me 4 hevalan ji aliyê eskerên xwîn mije tirkan pêvîst bû di pişkên dîke da ezê biçme ser wê babetê.

Em li de vera selmasê bûn û mijûlî kar û erkên xwe yê hizbî bûn heta davîya mehên payîzê. wê salê (1365) befrek giran barî û zistanek sext ser me de hat û em neçar man bin kepir û çadirên 2/3 kesî de bimînin lê me tab nekir û mecbûr man wê derê çol bikin.

Me berê xwe da gundekî bakûrê kurdistanê ku bi dirêjayîya çend sal xebata HDKÎ dijî rijîmê kedek mezin dabûne bizava rojhilatê kurdistanê û em li wan bûne mêvan. hindek hevalên me hêj li cîyê berê mabûn ew jî hatibûn agadar kirin ku bîn bigîjne me li wî gundê bakûrê welat, li dema hatinê dikevîne ber renîyê û mixabin pêşmergeyek egîd û xwedî tecrube binavê Ebdurehman deşt pêyma xelkê gundê axçeqla somayê canê xwe yê şîrîn li dest dide û têkelî karwanê cangorîyên bû. Riha wî şad serê gelê me sax be.

piştî çend rojan ku befir barîn sekinî û me hinek pêşîya xwe dît em ber bi mexseda xwe ku qerar bû zistanê li wê derê bimînin bi rê ketin. Lê rêyek dûr û dirêj pêşîya me bû, befrek zor û zistanek sext bû rêya me newal û gelîyên kûr û çîyayê bilind û serkêş de derbas dibû. Sibê zû me hereket kiribû dinya tarîbû em nêzikî mexseda xwe bibûn. Havînê ew rê qederê sê çar sieta bû lê befrê de rê çûn zehmet bû.

Pîyê mide gurê rîs û ser de jî gurên derzî hebûn lê wextê em gihîştin gundê duyê û em çûne malekê û min xwest solê xwe pîyê xwe bikim midît tenê solikek pîyê mide maye kita dinê min nezanîbû kengê û kîderê pîyê min derketîye.

Paş du/sê roja em gihîştine gundê kavlanê (rojhilat) ku xelkê wê ji alîyê rijîmê ve hatibû aware û derbider kirin hindî ji destê wan jî hatibû derban û xanîberên gundîya jî xira kiribûn. Em bi neçarî nav wan kawlên xirabûyî û bê seruber de man, bi her halê heyî me xwe çend derbaneka de cî bi cî kir lê bi rastî wê zistanê me zor û zehmetek zêde kişand li ber bê îmkanî û nebûna pêdavîstîyên xwe germ kirinê. Bi kurt û kurmancî em zoleme ber biharê ketin û bi sax silametî destê zistanê rizgar bûn. Weke roj bîra mide nine lê meha yêkê biharê sala 1366 em tîmek 15/20 kesî bo me'mûrîyetek hizbî ber bi cîyê erkê xwe birê ketin, ji ber ku hêştê befrek giran ser

rêya me ku çîyayên bilind û gelîyên kûr bûn hebû bo parastina silametîyê me lazim zanî em ser xaka bakûrê welat derbas bibin bo mexseda xwe.

Ez û kek Silêman keleşî û kekê Fadil bo naskirina rê li pêşîya tîmê de diçûn û çîya serketin alîyê dine çîya xaka bakûr bû hêşta tijî befir bû, me xwe ser befrê zeland û fasileyek zêde kete navbera me û hevalên me ku dû me re dihatin.

Em rûniştin heta heval digîjine me û me nav destê xwe de cigareyek berdayê ku neyê dîyar kirin. Fadil xwest seravekê bike doxîna wî bibû girêhişk gote min ka arî min bike wê girêyê weke nişkêda me her duya jî denge dengê bihîst lê me fikir kir xelkê gunde çon em li gund nêzîk bibûn yan jî belke alvêrçî ne derbas dibin.

Bi kurt û kurmancî me xemsarî kir ku me hindek xwe ser rê paşde neda. Em li çîya jorde dihatin ew kesên ku dengedenga wan dihat rêya rast de ber bi alîyê me ve dihatin. Şevêk tarî û zîlmat û hûrde baranek dihat , em hind pê hesîyan gihîştine me bi turkî deng dane me fişek birne ber sîlahên xwe û dora me girtin.

Ew hevalên me yê paş me tenê mêhran hat gihîşte me û niha em bûne 4 kes ku ji alîyê eskerên turka ve hatibûn dorpêç kirin. Me dest bo çekê nebir çonku berpîrs û fermanên wan yê ser sînora em nas dikirin hewdîtinên me çêdibûn ji bo ku çî pevçûn wan toxûban de çênebin navbera me de û wî heyamî تنها hizb ku wan deveran de hêza nizamî hebû hizba me (HDKÎ) bû.

Me wisa hesab kiribû ku piştî naskirinê yê me berdîn û çinabe. Ewan jî dizanî em kîne lema teqe li me nekirin. Çekê me li me kirin em birne qerequlê û em gelik jî êşandin. Lê wextê em çone jor wekî min gotî fermanê qerequlê em naskirin navê berpîrsên wî çaxî yê hizbê anîn.

Wextê em bi girtî birne qerequlê li me pîrsîn mesûlê we kêye? Me her sê hevala got kekê Silêman, silêman ji xwe berpîrsê tîmê bû û me jî bêşa xwe kir û got bila qîsên me her çaran yêk bin, sîstema eskerî de hesab ser xebera kesê yêkem tê kirin.

Nan û çay me re anîn em ser kursîya rûniştin eskeran bi çavekê ne, bi deh çavan li me dinêrî. Fermanê qerequlê hem li bal me hem jî bi tenê gelik bi kekê Silêman re

axivî. Bi kurtî daxwaza bacê dikir dava tifenga qenasê ku li mêhran bû dikir lê silêman neda, dava demança silêman dikir lê silêman got demança malê min yê şexsîye qenase jî malê hizbê ye ez nikarim bidim.

Bi bawera min eger me wê şevê daxwazên fermanê qerequlê qebûl kiriban û çeka ku wî dixast dabayê her wê şevê emê berdabana.

Eger biryar bi destê min de ba ez dibêjim minê qebûl kiriba çon karê wê zerera wê gelik zêdetir bû em nedihatî girtin çekên me jî li dest me nedigirtin.

Lê niha gelik sal ser wê bûyerê re derbas bûne ez bawerim eger kekê silêman zanîba ku dana çekê yê bibe sedema azad bûna me û bi salan nakevine hevsê rege qebûl kiriba ez ewê dispêrime qezaweta dîrokê.

Taze dinya ronî dibû bi destên kelepçe kirî em siwarî zîla sergirtî ya eskerî kirin û ber bi mexsedekî nedîyar birê kirin. Em birin bo leşkera bajarê colemêrgê , wî çaxî taze hukmê cûnta (kûdita) leşkerî ku 12ê îlona 1980 bi serkirdayetîya General Kenan Evren li dijî hukumeta silêman demîrel û bulent ecevît dest pêkiribû bidavî dibû. Torgut Ozal taze bibû serok wezîr lê hêştta kenan evren serkomar bû.

Pêş ku me li zîlê peya kin çavên me jî girêdan. em hinek pêlekana de jor de birin ku min nedikarî bi rihetî biçim, eskerekê pişve pênek mida ez girêl bûm piştî heyvekê cihê birînê ser ranê min bû û qalik dida.

Em bi destên kelepçe kirî du du kirine silûla de ez û fadil cîyekê silêman û mêhran jî silûlekê. Tinê dema nan xarinê me hevdu didît û ser mîzê nan xarinê destê me wedikirin. Hinek caran bi xasma li du sê heftîyên ewilî heta bo nan xarinê jî me hev nedidît û me hay ji hev nebû.

Rojekê dema ez û fadil bo nan xarina nîvro birin me dît gencek bejin bilind bi cilubergên temîz û modern temîz jî nan dixo lê gelik ser hemdê xwe dixo neko wekî me lezubez. Bo me gelik balkêş bû. Wan heyama me xêncî eskeran çikes nedîtibû em rojê sê cara dianîn bo nan xwarin û ser avê destê me şev û roj kelepçê da bûn me nedizanî çî wexte kengê şeve û kengê roj.

Ewî gencî gelik berê xwe dida me lê me newêrî tiştêkê lê bipirsin. hinekê xwe li min nêzîk kir got hûn pêşmerge ne? Çon kincê me yên pêşmergetîyê ber me de bûn.

Migot belê

Got ez li "Ozgurluk yolu" me. Ozgurluk yolu rojnama ziman halê partîya sosyalîst a kurdistanê (PSK) bû ew partî deste bira bû gel hizba me. Min dizanî ozgurluk yolu (rêya azadî) rojnameya psk ye lê fadil nedizanî û serê xwe jî bi tiştên wisa ve nedîşand tam beruvajî min.

Bi îşare min gote wî gencî ku ez halî bûm. Wî dixwest ku zêdetir qise bike û bipirse lê me xwe re nedît li ber eskera û hem jî dema nan xarina me xilas bibû û destên me kelepçe kirin lê ewî xurtî çî hesab eskeran re nedikir .

Çawa ku di pişka sê de min bas kiribû ew zîndanîyê ku dixast me zêdetir bikewe têkilîyê ser bi partîya sosyalîst a kurdistanê (PSK) bû. Navê wî camêrî ISHAQ bû. Piştî heyvekê kê m zêde, em her çar anîn bal hev li silûlek çar kesî de ku du textên du qatî bo nivistinê tê de bûn ber texta jî cîyek sê mêtîrî bû ku me nobetî qedem lê didin çon lingê me req dibûn ber razan û rûniştinê.

Ez cigarekêş bûm dilê min gelik diçû cigarê carubar eskeran cigareyek berdidayê û didane min lê silûlê de me her çaran gel hev ev cigare dikişand.

Di wan du heyv û çend rojên ku em li girtîxana eskerî ya colemêrgê da bûn me yêk carî jî imkana hemam kirin û cil şuştinê çinebû em gelik qirêjû bibûn.

Xêncî ishaq ku min bas kir me wê derê du girtîyên dinê jî dîtî ku xelkê devera şemzînan bûn bi tometa hewkarîya pkk hatibûn girtin navê yêkê ehya û yê dinê mixabin navê wî nayê bîra min.

Rojekê danê êvarê esker hatne jor û li me xwestin ku cilkê xwe solê xwe li xwe bikin, me nedizanî ka yê çilme bikin û çî qewimîye. Kelepçe li destê me wekirin û em birin derwe rojê gerim û tav bû zêdetirî heyvekê bû me ronahî bi çavê xwe nedîtibû.

Efserekî bejin bilind li wê derê hivya me bû silav kir halê me pirsê û got min perwendê we xandîye û dizanim hûn ser bi kdpê (hdkî) ne, hevaleyê min yê naskirî hebû binavê Simko Elyar û min xwest we bibînim. Paketek cigarên tekel 2000 danî pêşîya me gelik muhebet kir pirsaxwarin wexwarinê li me kir û got kesek we aciz nake?

Piştî du heyva (kêm zêde) em dest kelepçe kirî şandine Gewerê cîyê ku em lê hatibû girtin em birne dadgahê hakim û savcî hinekê bi hewre qise kirin û "tutuklugun devami" yanî hukmê girtina me dirêj kirin.

Birna me bo dadgeha Gewerê nav xelkê welatparêz û dostên hizba me deng wedabû û xelkek zêde hatne dîtina me. Xelkê Gewerê pêşmergekê hizbê li nêzîk ve nas dikirin hewbîr û hewfîkrê me bûn lema rijîyane dadgahê bo dîtina çar pêşmergekê girtî yê hizba demokrat.

Baş bîra mine gencek keşxe û şîkpûş ku cilkên sipî li xwe kiribû li salona dadgahê xwe li me nêzîk kir bi dilsozî û dilgermî got : "Hevalê bar giranim hevalê şorişvanim" ew kes kekê Esed Canan bû ku wekîl bû, salên paştir me yêk du car hevdu dît û basa wê rojê dikir. Kekê Esed wan salên davîyê ser lîsta HDP bû parlementer li parlamana turka.

Ser êvarê em şandin zîndana Gewerê. Gelik li zîndanîya nasyar û welatparêz bûn em bi germî pêşwazî kirin te digot qey em pêşmergekê li mala welatparêzekê mêvanin. Xwarin wexwarin amade kirin. Du sê roj mabûn bo eydê şandin pezek anîn zîndanê ser jê kirin. Nav xwede pare kom kirin bo me cilkê binî kiras gore wesayilên ridîn tiraşînê kirin piştî nêzîk sê heyva me xwe şoşt weşoşt û rûyê xwe tiraşî. Hestek xweş û kurdane bû em xizm xal ketin. Mala hemû kurda ava be ...

Zîndana Gewerê biçûk bû kêmtir li bîst kesa tê de diman du memûr zîndanê xelkê gewerê bixwe bûn reftara wan bi girtîyan re gelik dostane bû bo me jî wisa bûn. piştî çend roja hevalên berpîrs li HDKÎ kesik şandibûn dîtina me kêmtir diravek jî şandibûn lê berketî nebû ema li nebûnê baştir bû ez cigarekêş bûm gelik dilê min diçû cigarê lê parê me çinebû.

Piştî nêzîkî çileyekê ku em li zîndana Gewerê diman mixabin dîsa destê me kelepçe kirin çavên me girê dan siwarî zîla eskerî kirin û ber bi zîndana colemêrgê birin berê em li hucreyek eskerî de bûn li colemêrgê.

Weke min îşaret pê kir em berê li hucreyê eskerî de diman lê wê carê em birin zîndana colemêrgê ku ew dibêjinê tîpa E ... bendên zîndanê weke pîta E hatîye çêkirin her derekê wê pê dîvarê bêtonî hatîye çêkirin û modêla zîndanên amrîkayîye eger miro nezane dibe ku nav de bezir be û benda xwe jî nas neke.

Em birin deftera kontrolê û em li hev cuda kirin ez û fadil dane bendekê, silêman û mêhran jî dane bendek din.

Wextê ez fadil çone nav bendê dema firavînê (nanê nîvro) bû jorek cihê 15/16 kesan bû textên du qat bo razanê TVyek mezin bi dîvar ve bû, me silav kir hindeka silava me wergirt.

Fadil kesek nîşanî mida got tu ewî nas dikî me hucra eskerî de dîtibû? Rast digot. Me her duka bi îşaret silav li hev kir wî jî em naskirin. paş xweş û bêş bûnê çayek dane me.

Kesek ku bi temen li hemû girtîyên wê hucrê mezintir bû xwe li me nêzîk kir zimanê wî digirt bi îşaret ew kesê ku fadil jî nîşanî mida bû nîşan da û got tenê ew kesa dikare li we nêzîktir be ew kes jî ISHAQ ê PSKYî bû.

Zîndana colemêrgê sîyasî nebû û girtîyên sîyasî têde xudan nedikirin lê çon malbata ishaq hemû bab bira xwîşk kesukar di postên bilind yên îdarî de bûn karîbûn bi rapora doxtur (muayîne) ishaq li zîndana colemêrgê de bihêlin ji xwe li turka bertîl û rişwe kevir nerm dike. zîndanîyên sîyasî ser qerarê "Yuksekk guvenlik mehkemesi" (dadgeha emnîyetî ya bilind) li zîndana dîyarbekir bûn.

Ew kesê bi temen ku min serwe bas kir navê wî Ehmed Varol xelkê devera oludere girêdayî gewerê bû mirovek qise xweş û welatparêz bû bi hizir kesekî çep lê rojî nivêjê wî nedîçon. Nivêj deyqekê yan kêmtir xilas dikir me bi şoxî û henek digotê keko yên salim nivêjê dirêjtir dikin çawane tu hem lalî hem wisa kurt kurt nivêj dikî?

Dikenîya digot ez hema bela nivêjê xwe wedikim.

Ew û birayek wî yê biçûk bi curma kuştina kesekê hatibûn girtin digot ew birayê min bê aqile ez jî pêve bendewar bûme.

Em wê havînê heta bihara sala paştir li hewsa colemêrgê de man, rastî xelkê wê derê heta karbidestên zîndanê ku xelkê xwecî yê colemêrgê bûn hind qedir qîmet û dilsozî didane ku me şanazî bi gelê xwe, xwe û navê pîroze pêşmerge dikir.

Paş heyamekê mêhran û silêman jî anîne bal me. silêman radio'ke panasonic hebû ku me hem xeberên bbc farsî hem jî radio dengê kurdistanê îranê guhdarî dikir û dengubasên kurdistan û cîhanê agadar dibûn.

Colemêrg cîyek çîyayî ye û zistanê befrek zêde lê dibare her bendek 15/16 kesî hewşek hebû bo leyîstina walîbalê wextê befir dihat me her çara befra hewşê dimalî dianî towalêtê av pêde dikir diheliya ku em bikarin walîbalê bileyîzin, piştî çend roja dîsa befir dibarî dîsa karê me dest pê dibû û em pêve mijûl dibûn û wext pê derbas dikir.

Ishaq bi esil xelkê bajarê sêrtê û ereb bû kurdî kêr dizanî lê kesekî gelik egîd ezîz xudan exlaq û şexsîyet û şorişgêr bû, carekê gote me dilê we diçe çi risqekê ez bêjme dayka xwe bo we çêke û bîne?

Me daxwaza keledoşê kir, heftîyê carekê kesukarê zîndanîya dikarîn bêne dîtina zîndanîyê xwe, ishaq got ez xwe nizanim keledoş çîye lê dayka min derucînarê kurd hene yê pirs ke û çêke.

Piştî heftîyekê dayka rêzdare ishaq bi beroşek mezin hat, ishaq çi carî keledoş nedîtibû derîyê beroşê ser rakir tijî pincar sêvik û hestîyên goşt û gelik qerebalix bû, ishaq serê xwe hejand û got ez nikarim tenê kewçîyekê jî bixom.

Wan rojên sîr û sare colemêrgê de ku em bi befrê re mijûl dibûn difna min xwîn lê dihat û nedisekinî bi neçarî ez bi ambulansê şandim nexweşxaneyê bajêr ez razandim ser text û lingek û destek min bi text ve girêdan. Mamostayek kurd ku bo ders dana zîndanîyan dihate zîndanê wê rojê xwarin bo min anî û hate serdana min.

Roja din hewjîna ishaq hate serdana min, ishaq gotibuyê bêd serdana min bike û hinek pare jî bide min jiber ku çî pare bal min nebû.

Xanima ishaq weke doxtur li nexweşxanê kar dikir jinek tijî şeref namûs heysîyet û şexsîyet bû. Wextê hate odeya min ez bi tenê bi dest û lingê kelepçe kirî dîtîm ku du esker jî bi çek hindayî serê min sekinîne serê xwe hejand û gote eskera girêdana destek an pêyekê bese ji xwe nesaxe nikare istirahatê bike.

Destê min da wekirin û 100

îrê turkî jî pare da min got min nîne neku minê zêde daba te (dinyayek sipas û pêzanîn bo wê şêre jina egîd)

Piştî çar roja ez wegerandim hewsê û min ew 100 lîre dane ishaq û min gotê min xerc nekir bide xanima xwe ... ya rastî min dil neda parê wê xerc bikim.

Ishaq kurek delal û dilfire bû hem jî gelik cindî xweşik û bilind bû min yarî pê dikirin carekê migotê ishaq tu hinde xweşik bejin bilind û şîrînî niha xwîşkê te çend cindî ne?

Got erê wisaye mebesta te çîye?

migo belkî ez bûme zavayê we!

Got xudê tîpê te xweş nine ez bawer nakim şû bi te bikin

Migo tîp çîye mala te aqil muhime

Got ca kê goh dide aqil hemû bi çav dibînin

Em her qederê carekê dibirin dadgahê lê çon me wekîl çinebû û wekîl girtinê pareyek zêde dixast û me çî çinebû carek dinê qerarê "tutuklugun devami" yanî middetê girtina me dirêj dikirin û em wedigerandin zîndanê.

bi hatina biharê me daxwaz kir me bidene dadgahek sîyasî belke em tişteke halê xwe bizanin, me cevab wergirt ku demek nêzîk de yê me bişînin dadgeha emnîyetî ya bilind li dîyarbekir. Çend zîndanîyê dîyarbekrî yê hevalê me li zîdana colemêrgê , xeber malbatê xwe re şandin ku 4 pêşmerge tên bo bal we lê hişar bin xizmeta wan bikin.

Girtîyek bi navê Nemet koşlu xelkê bajarê riha (urfa) yê bi curma tolwekirinê bi 16 salan hatibû mehkûm kirin li zîndanê jî gelik bi memûr û kar bi destan re ketibû şer û munaqîşê cezayê wî bibû ebed (muebed) ku dibû 32 sal, wî demî Nemet dorberê 30 salî dibû.

bi eşkere dijberîya sîyaseta deshilatdarên zîndanê dikir.

Min îcaze wergirt û çome serdana wî çon emê zûyatî şandibana dîyarbekir min xwest xatrê xwe lê bixwazim û min fikir kir ku belke êdî em hevudu nebîn.

ez çome bal paş silav û xêr anînê got min gelik pê xweş bû ez bême serdana we pêş hûn li wir biçin lê îcaze nedan min.

Nemet çend roj berî hevdîtina min û wî xwestibû li zîndanê birrewê lê şans neanîbû.

Textê wî ber derî û qata 2yê bû nan penîr û zeytûn anî em bixon got ew penîre dayka min heftîya borî mire anîye.

urfa li colemêrgê dûre û nemet ji malbatek feqîr û belengaz bû, birayê wî hatibû kuştin nemet jin bira xwe mare kiribû û sê zarokê birayê wî jî hebûn.

Tam di wê demê de reyîsê zîndanê bo kontrol kirina zîndanê hate bendê ku gelik polis û gardîyan jî pêre bûn. Dibe ku turkek faşîst be bi xasmayî li zîndanên kurdistanê ku girtîyên wê hemû kurd bûn berpirs û mesûlên faşîst hildibijartin. Li zîndana colemêrgê tenê turkek hebû navê wî Turan kaya hebû ew jî surgun(tebîd) kiribûn.

Bi hatina reyîs, zîndanî hemû rabûne ser pêya lê Ne'met cîyê xwe nebizivî. Reyîs çon nav bendê rewşa zîndanê li hin kesa pirs kir lê çavê wî tim li ser Nemet bû ku ça wedixwar. Li textê nemet nêzîk bû gotê navê te çîye? Got nemet koşlu ... xelkê kîderê yî? Got urfa ... got te çima bersiva silava min neda û ranebûy serxwe? Nemet got silav heqê te û bersiv dan yan nedan jî heqê min e. Ew kelîme hêsan nebû û her kes nikare cevaba reyîs wisa bide.

Ew çon min gotê keko wisa neke te dibin aciz dîkin te didin û dikine hucre de ...

got : ez heta niha 3 cara rewîme (helatime) û hatime girtin 32 sal ceza li ser mine û jîyana min yê li hewsê de derbas be ez rojekê zûtir li wê cehnemê xelas bim min fayde kirîye.

em çone rûyê hev û bi giryan û dilek şewitî me xatir ji hev xwest û mixabin me êdî hevdu nedît.

Ishaq her tim digot ezê bîra we bikim û nîgeranê we bim ka yê çî bi serê we bê.

Digot me zîndanê de çî çînîne em yadigarî bidin hev ezê weke adetê zîndanîyan bi cigarê yadigarîyekê ser bedena we çêkim, silêman mêharan û fadil qebûl kirin lê migot ishaq xudê ez nikarim tehemul kim. Eger ez razam yan min haj xwe nebe tu hingê dikarî yadigarîyekê ser bedena min çêkî.

Ez û ishaq derengtir li hevalên din dirazan ewî rojname dixand basa serpêhatîyên xwe û malbata xwe û pirranî basa conta (kûdita) eskerî 12ê îlona 1980 dikir ku du sala hatibû girtin û eşkence kirin.

Şevêkê li wan şevan min ser textê xwe qata duyê ser zik dirêj kirîye her du destê min bin serê minin ishaq jî nebêje amadeyî pilana xwe ye firçe (misvak) girtîye destê xwe here didanê xwe bişo ez jî bendê me ku ew derkewe ez biçim didanê xwe bişom . Me kuçkê biçûk yê berqê çê dikirin carubar şevê yan bi roj dizîve çayek xarinek çêdikir. Got ezê herim diranê xwe bişom ez nivî xew nivî hişar bûm TV jî me dengê wê kêmbû kiribû. Ishaq kewçîyek danîbû ser agir û sor dike min hind zanî agir berbû milê min ez xirab weciniqîm û textê re jî ketim xwarê.

Ishaq kurdî baş nedizanî lema hemîşe digot kurdî gel min xeber din ku ez fêr bim. wextê ez textê de ketim ishaq bi wê kurdîya xwe ya nivîşkan got : Ayyy çibû Enver abê, xudê ez karê baş nekir xudê xoş nebû ...

dilê wî girtibû kelugirî ketibû gewrîyê migot tişteke nabe , hinek kes hişar bûn çî bû çî qewimîye ...

Yadigara ishaq niha jî ser milê min heye heta mirinê jî yê bimîne.ew insanê hinde necîb esîl , kurd nebû lê şorişgêr kurdhez û kurd bû.

Paş çendîn sal pirs kirinê , kekê silêman destpêka sala 2020an de têlêfuna wî bo min şand (sipas bo kekê silêman) û em qise dikin û bi hewre kêfxweş dibin û basa rojên hewsê dikin.

Derdurê heyva gulanê sala 1367 hicrî em hatin agadar kirin ku filan rojê yê me bişînin zîndana dîyarbekir bo dadgahê (yukse guvenlik mahkemesi) ji ber ku dadgah kirina me heta niha ber curma derbas kirina neyasyî sînor bû helbet gor dîtina wan nexwe em ser xaka welatê xwe bûn, lê niha û pêde curma me sîyasî bû em pêşmergek çek bi dest bûn û dibe li dadgeha emniyetî bîn mehkeme kirin.

Rojekê li wan rojan me kincên xwe levpêçan û xatirê xwe ji dost û hevalên xwe yê zîndana colemêrgê xwest. destên me du kesî pêkve kelepçe kirin û em siwarî zîlek eskerî kirin çend eskerek bal me siwar bûn cîbek pêş zîlê yêk jî dûre dihat em ber bi hewsê dîyarbekir birin. destê min û fadil pêkve yê silêman û mêhran jî pêkve bûn cadên turka yê trafik zîla kevin û bêhna gazoîlê serê mêhran û silêman girtibû dilê wan têkel dibû lê ez û fadil kêmekê baştir bûn.

Em şevê gihîştin Amedê bi qûrre qûrre eskera û dîtina bircên leşkerî û dengedengê xûya bû ku em li mexsedê nêzîkin. Em li zîla peya kirin çendîn siet bû em dest girêdayî ser kursiyên dar req bibûn. Em birin deftera reyîsê zîndanê lê şev bû reyîs ser kar nebû.

Çawa ku min berê jî bas kiribû hevalên me yê zîndana colemêrgê xizm û xanevadên xwe ku hinek gardîyan(nigehban) bûn agadar kiribûn çar pêşmerge anîne wê derê lê hişar bin. Wan kesên hêja û dilovan jî demudest em peyda kirin. Cilubergên me yê kurdî ber me de bûn helbet ne yê pêşmergetiyê çon ew kevin bibûn me havêtibûn. Dost û hevaleyê dilsoz û welatparêz û cesûr li urmîyê çar dest cilubergên kurdî qîyasî bejnubalê me dabûne dirûn bo me anîbû û hatibû serdana me û ew kinc ber me de bûn.hemen wî camêrî carekê jî karîbû xwe bighîne dadgaha me û salona mehkemê de hazir bibû. Ez çavên wî radimûsim û keda wî qet nayê ji bîr kirin.

Li îdara zîndanê de gotin gereke hûn cilkê xwe biguhurin û yê hewsê li xwe kin digotnê tek tîp yanî cilkê hemû zîndanîya weke yêke. Parçê wan rengê reş dirûmanek bê seruber hebûn te destê xwe didayê destê te reş dibûn miro tê de rengê mirova nedida.

em çone nav bendê ku 200 kesî bû hinek cara 240/250 kes jî zêdetir dibûn. Li her du alîyê bendê (kavoş) textên asin yê giran û stûr pêkve coş kiribûn li textên sê qat pêlekanek jî ber hebû ez ser ketim qata jor navpêşîra şalê min çîrrr dirrîya û lev cuda bû yanî hinde bê seruber dirûbûn.

Zîdana ku em birnê zîdana amedê ya kevin bû ew zîdane ya ku sitrana Nûrê û saliho li ser tê gotin. Kevintirîn zîdana bajêre ku bi dirêjîya dehan sala xurt û xebatkarên kurd lê hatine girtin işkence kirin û darda kirin. Ew zîdan li dîvarê kela dîyarbekir de hatîye ava kirin ji ber dîvarê kelê parastina zîndanê bo turka hêsantire. Di wê hewsê de şeş bendê girtîya hebûn ku bi roj girtîyên du benda li hewşê dikarîn hev bibînin û danustanê bikin. Dortadorê hewşê bêtonî û bin dîvar jî hinek bilind kiribûn ku zîndanî ser dirûniştin her kesî jî kursîkek biçûk hebû bo ça wexwarin û sohbet kirinê.

Em bi şev derbasî wê bendê bûn ku cihê mana me bû. Em ber derîyê bendekê re derbas bûn ku pirranîyê girtîyên wê sîyasî û ser bi PKK bûn. Wan sala pkk xebata xwe berfireh kiribû heta dixwestin ku girtîyên wan zêde bin ku deng wedanê çêke û bibe fişar bo ser dewleta turk û raya giştî medya çapemenî di asta cîhanî de ser binivîsin bixwînin û bala dinyayê bikşînin ser doza rewa ya gelê kurd.

Piştî çend sal hukumeta conta (kûdita) yê Torgut Ozal taze bibû serekwezîr medya û rojname radio û televizion hinekî azad bibûn basa zîndanîyên sîyasî dikirin ku meselen filan eyalet yan vilayet yan gund û şarî hinde endamên pkk hatin girtin û dengwedanek baş çêdibû.

Pkk bi rastî zîndan kiribû zanko. Rojane kursên sîyasî hebûn li ser daxwazên kurdistanî û hizbî , dîroka kurd û kurdistanê, û zimanê kurdî perwerde didan beşdaran.

Wextê em ber derîyê benda wan re derbas bûn xêrhatina me kirin û bi dengê bilind gotin : BIJÎ PÊŞMERGE ..

Her tişt bo me taze bû li hewsê Amedê de, hin xelkê welatparêz û kurdperwer bo me rû nivîn, wesayilên xwe yê temîz anîn yê dewletê pîsupoxil bûn mirov micêz nedikir têde razê qirêja sala petûyên eskerî webû reş û zivir te digot qîfarin bedena mirove diçe.

Roja paştir çend heval li partîyên kurdî bi nunertîya hizbên xwe hatin serdana me xêrhatina me kirin xwe dane naskirin me jî kek Silêman weke nunerê xwe da naskirin. Pêvîstî û hewceyîyên me pirs kirin û ka em kîne ji kîjan hizbê û girêdayî kîne ser çî hatine girtin û hinek pirsyarên din da ku çî ji destê wan tê bo me bikin. Bi rastî me hest kir me xudan heye û bê keskar ninin weke bira dost û heval mere ketine danustandinê, mirov şanazî bi pêşmerge bûna xwe dikir ew rêz û rûmet, qedir û qîmet li ber şorişgêrî hizbî bûn pêşmerge bûnê li me hat girtin nexwe hewsê Amedê tijî sofî mela û endamên rêxistinên radîkal ên îslamî bûn ku quranek zexim didanîn pêşîya xwe şev û roj pêre mijûl dibûn lê dayik jin şeref û heysîyeta kurdên şorişgêr tanîn pênc qoruşa û bêrêzî dikirin lê gelik jî li şorişgêran bi taybet li hevalên pkk ditirsîyan.

Hewceyîyên me yê rojane weke dewrî kewçî nivîn rûnivîn û ... hemû paş yêk du sieta me re anîn hindek jî pare bo xercê rojê dane me û gotin : em li wir hemû bira û hewbîrin em we ji bîr nakin ya ji destê me bê emê bikin bi xasmanî ku we hewceyî bi wekîl heye emê sendîka û baro'ya Amedê agadar bikin ku bi were hewkar bin, ew bixwe hêvî û omîdek mezin bû.

Piştî roja û heftîyan me zêdetir xelk û etrafê xwe (dewre û çewre) naskir rabûn rûniştinên me çê bûn berpîrsê wê benda sîyasî kesek bû bi navê Selanîk Omer ku bi birayekî xwe ve zîndanî bûn. Rêzdar Selanîk şaredarê bajarê qiziltepe girêdayî Mêrdînê bû wî demî hêştta çî partîyên kurdan bixwe li bakûr çinebûn ku tevlî

hilbijartinên perlemnto û şaredarîyan bibin û kurd ser lîsteya SHP ku partîyek qaşo sosyal_demokrat bû beşdarî li çalakîyên sîyasî û hilbijartinan dibûn lîderê wê Erdal înonu kurrê ismet inonu yê kerr û guhgiran bû.

pêş hatina me de Rêzdar kek Ehmed Turk berpîrsê benda sîyasî bû lê di zîndanê de ser lîsta SHP beşdarî hilbijartinên perlemento yê bibû û bibû milletvekili û hatibû berdan paş wî kekê Selanîk cîyê wî de bibû berpîrsê bendê.

Di benda sîyasî de jîyan bi avayek dinê dimeşîya hemû bi hewre şîrîk heval û wekhev bûn yêkê pare heba bi hew re xerc dikirin asta têgihîştin pêgihîştin û wekhevî asta herî jor de bû, xwarinek malbatî derweyî zîndanê hatiba hemûya dixwar komek û yardimek derweyî zîndanê li alîyê xelkê welatparêz hatiba para hemûya têde hebû û navxwe de parve dikirin.

Ez bêjim kek Silêman gotibû kekê Selanîk em nikarin cilkên zîndanê li xwe bikin ku kekê Selanîk çu îdara zîndanê cilubergê me anîn û me li xwe kirin. Kekê Selanîk salekê berî niha hatîye welatê swêdê û sipas bo kekê Silêman ku pêzanîbû têlfuna wî min re şand me çend carî qise kirîye lê mixabin me hêj nekarîye hevdu bibînin ew jî zêdetir korona bûye rêgir, bi hêvîya dîtina kekê Selanîk di demek nêzîk de.

Bi roj ve em dihatin derwe(hewşê de) me dema xwe bi bas û behsên sîyasî bi hevalên şorişgêr derbas dikir bo min gelik balkêş bû ew hemû insanên xwendevan xwe pêgihandî û agah li ser zimanê paqije kurdî agah li ser bûyerên cîhanî herêmî û kurdistanê nêrînên curbicur , ez qet lê têr nedibûm û min bi hûrî guhdarî dikir gelik caran jî ez diçome kurs û kilasên wan û jê hîn dibûm.

weke min berê jî gotibû ew kurs û kilas ji alîyê pkk ve hatibûn danîn û min çicar ewqas genc û xurtên xwendevan xwenas û welatparêz li cîkê de nedîtibûn bi taybetî ser dîroka welatê xwe min yan çu nedizanî yan kêm û pirtî pirtî dizanî.

Yêk ji wan gencên pêgihîştî û xwendevan ezîzek bû bi navê Şêxmûs kaya, bi bejnubal weke min nebilind bû çavreş û devzuha û reş esmer bû min bi henek digotê tu rengê ereba didî.

Şêxmûs li malbatek dîyar û dewlemende Amedî bû dengê xweş stûr û wekî dibêjin nêr û mêranî hebû hewsê dîyarbekir de sedan xwendevan hebû ku xwendina bilind ya zankoyê xilas kiribûn.

Hingê rojane rojnameyên Cumhuriyet, Milliyet, û Sabah ku taze dest bi weşanê kiribû dihatin zîndanê. Kesên weke

Muhemed Elî Bîrand rojnamevanê naskirî li ser bizava kurdî û xebata çekdarî a pkk û bi giştî pirsê kurd û kurdistanê bi awayek berfireh û tundutîj dinivîsîn û şirove dikirin. M.Elî bîrand bi rûyê xwe yê geş û qisên xwe yê xweş li turkîyê zêde dihat heskirin û el_aqîbet wextê pêvajoya çareserîyê li turkîyê bo pirsê kurd dest pêbû wî jî xwe nekarî û ragihand ku esluneseba wî kurd e.

Zîndanê de rojname bi pere bû gereke hatiban kurrîn û çon pare kêmbûn kek Şêxmûs libek dikirî û bi dengê xwe yê nêr û mêr bilind bilind û bi turkîyek rewan dixwend û hemûyan guhê xwe didane Şêxmûs.

Pkk wî demî zîndanê de deshilat û hukmê xwe hebû kitêbxane bi sedan belkî hizaran pirtûk govar tê de hebûn. Min carekê gote şêxmûs :

_Yaho ma ew kitêb û pirtûk li turkîyê qedexe kirî nînin?

+ derwa qedexe ne lê li hundur azadî!

_ Yanî çî şêxmûs?

+ Yanî ez sexmeratî wan pirtûkan hatime girtin û zîndanî bûme zîndanê wêde yê min bibin kuderê?

Em herdu bi wê hazir cevabîya wî ya xweş û qanûnî kenîyan.

Min pişkên berê de basa Eslanîk Omer kir ku sîyasetmedarek kurdperwer, dilsoz û şaredarê qiziltepe (Mêrdîn) bû carekê basa buyerek sêçim (hilbijartin) ê dikir û bîranînek xwe bas kir :

" Piştî hukmê conta (kûdita 1980) hêdî hêdî karê sîyasî azad dibû erdal inonê jî partîya şhp damezirandibû ji ber sosyal_demokrat bûna hizba wî kurda xwe li wî

nêzîk dikir wî jî pêvîstî bi deng û piştgirîya kurdan hebû. Hevalên Ehmed turk, Leyla zana, Sîrrî sakik, Selîm sadak, Orhan dogan ser lîsta shp bûn milletvekili em jî ketin hilbijartinên herêmî û min beledîya qiziltepe qezenc kir. Erdal înonu bi wê serketinê kêfxweş bibû biryar dabû beşdarî şahî û merasima gelê qiziltepe bibe û min bide naskirin. Me jî karê mêvana kirîye bo 200/300 kesî, xerçek zêde me kirîye ku patron bê. Erdal inonu pê hêlikoptêrek eskerî hat me pêşvazî kir qerar bû Erdal axivtinek kurt bo kesên pêşvazîyê de bike û paşê biçin cihê mêvandarî û komcivînê. Nişkêda yêkî kurd cemedanîya xwe li stuyê Erdal înonu kir wextê millet cemedanî stuyê înonu de dîtin dest bi siloganên bijî kurd bijî kurdistan bijî pkk bijî gellê kurd û ...

Erdal bi ecîbû got ka zû min qiziltepe derxînin. Migotê patron me merasim girtîye karê firavînê kirîye parîyek nan bixwe paşê here, got eger tu dixwazî dewleta turk min darda bike ez bêm firavînê bixom ma tu dewleta turk nas nakî? Eger du sê sietên din wira bim kesin dewlet yê min bikuje."

Go me çikir qebûl nekir heta wextê dîyarî kirî bimîne û pê hêlikoptêrê wegere lema em mecbûr man me du sê maşîn hazir kirin pê maşîna ber bi mexseda xwe ve çû. Şêxmûs gelik hej cigarê dikir, mirovekî zeîf lêvreş devzuha bû ber cigare kêşanê, bi temen sê çar sala li min mezintir bû. Min pêşda bas kiribû li benda girtîyên sîyasî de malê şexsî çinebû sîstema wekhevîyê çêkiribûn pare û xwarina hemîya weke hev bû çon gelik girtîyan pare çinebûn yan malbatên feqîr bûn yan jin û zarok hebûn ber hindê zîndanê de çî heba para hemuya bû pirranî cigarên erzan weke samsun û maltepe hebûn min xwe maltepe dikişandin ber bê diravîyê, bêhna peyîn lê dihat. Şêxmûs nedikarî wan cigara bikişîne dihat ez peyda dikirim digot yaho ka hebekê tama devê min xweş ke. Wextê em colemêrgê anîn amedê camêrekê boksek cigarên Marlboro me re kiribûn şêxmûs basa marlboro ya bû.....

Bihara sala 1373 hicrî bû em tîmek 15/16 kesî pêşmerge li binya çîyayê çilmêrê şehîda derbas dibûn. Rojên biharê yê dirêj gîya bilind bûye bêhna gul sosin alal û beybûna tê rêwas serê xwe derêtxin car car em rê derdiketin me çend tayê rêwasa diqetand û newsa xwe pê têr dikir. Em bi rêz û fasileyek bi qerarê partîzanî diçon ez

kesê pêşîyê bûm radio ber guhê mine ez guhdarîya pişka kurdî dengê amrîka dikim
em gihîştin çepa ku dizivire binya çîyayê şehîda midît kesekî bi çek rabû serxwe û
got bisekinin!

Kiçek taze pê gihîştî û bi kincên pkk ê.

migot

_em çima bisekinin heval?

+ heval ser rêya we ne hûn nikarin derbas bin

_ başe bila heval hebin me çi moşkile bi hevalan re nine tu dikarî pirs kî.

+ hûn kîne?

_ Em pêşmergên hizbê ne xelkê wê herêmê ne , xo ew der ne pasta bazresîya îranê
ye, ne qerequla turkane ewa xwelîya kurdistanê ye rojhilatê kurdistanê cihê kar û
xebata me ye ...

Nexêr hindî min zor got ewê kêmbihîst û em tehdîd kirin ku yê teqê li me bike.

hevalên ku em bi hewre bûn tenê kekê Cefer û kekê Kavûs bîra mide mane mixabin.

Migot emê herin hûn jî keyfa xwe bikin em rê ketin.

ewê bi dengê bilind kire hawar û heval weke mostanka (mêrû) dest bi çek ber bi me
we hatin lê çi teqe nekirin çon em ser xwe diçon lê bi amadebaşî.

Me nîyeta şer û dest bo çek birinê çinebû û deyan car em bi wî rengî rastî pkk hatibûn
eger me jî wekî wan kiriba bêşik şerê birakujî (xwekujî) yê çêbiba.

Ber bi me we dihatin em jî rêya xwe de dimeşîyan nêzuk bûn me bi hewre qise kir.

zanîn em serxwe û amade ne ewan jî sist kir, di wê heynê de çavê min kete Şêxmûs,

_Enver!

+Şêxmûs

me xwe bersingê hev da em çone çavê hev û çone nava xeyala û zîndana dîyarbekir ...

Em mêvan kirin bo nan xwarinê û çayek bi tam û lezet ya ser agir û çaydanê reş jî
dane me li quntara çîyayê çilmêrê şehîda.

me sipas lê kir û em rê ketin ber bi mexseda xwe.

Sal û nîvekê paştir ez li gelyê dirya bûm li bakûr bo wezîfeyek hizbî ez li malekê bûme mêvan min rojnamê te dît ku kek şêxmûs weke berpirsyarê sîyasî_nizamî yê pkk li dîyarbekir bi hewjîna xwe re di şerekê de canê pîroze xwe gorî xak û xelkê kurdistanê kirîye û tevlî karwanê nemiran bûye helbet navê wî yê kod hebû. Riha pak û paqije şehîd şêxmûs xanima wî û hemû cangorîyên rêya rizgarîyê şad be ez bejna xwe bi rêzdarî jêre diçemînim.

Hevalên pkk'yî û partîyên din yên kurdî seba mafên xwe yên zîndanê, pêre gihîştinê, û milaqat huzûrî dest bi gireva birçî bûnê kirin.

daxwaz li me jî kirin ku em jî bi wan re harîkar bin destek bikin û bikevin girêvê.

Lê çarenivîsa me nexûya bû hêj em dadgahî nekiribûn li alîyê din me dizanî rejîma îranê em ji dewleta turka daxwaz kirine ku me teslîmî wan bike lema me meslehet nezanî beşdarî girevê bibin û min gote wan keko duruma me wisaye lê em bi dil û can bi we re ne, ewî jî got hûn pêşmerge ne hûn şorişgêrin hûn dibe bi me re bikevin gireva birçî bûnê eger hûn bi kiryar tevlî me nebin emê çij ya dilê we de bikin? Qisa wî rast bû lê em êxsîrê du rejîmên faşîst bûn û berupîştê kêra wan em dibirrîn.

Ew gireva birsî bûnê tam kete meha remezanê û li zîndanê de gelik girtîyên îslamî yên ifratî û radîkal hebûn timî quran û pirtûkê dînî dixandin zikir dikirin taet û ibadet dikirin xenî bibûn ku hinde wext bo dîndarîyê peyda kirîne. Nifir li zîndanîyên kurd yên şorişgêr û welatparêz dikirin digotin hemû kafîr û bê dînin. ew bisilman pirranî hizbullahîyên kurd bûn ku bi dizîve ji alîyê rejîma melayên îranê ve dihatin piştîvanî kirin.

Bi taybetî zehil û zendeqa wan li me her çar pêşmergeên hizbê diçû digotin hûn çawa şer gel dewleta xomêynî dikin? Mirovek hinde bisilman û nûranî hûn çawa dijberîya wî dikin?

Ez û fadil hewşê da bin sîbera dîwar rûniştibûn me cigare dikêşa xwe re qise dikir,
min hind hajê bû yêkê pênek qahîm lingê mida migot belke heval û dostin heneka
dikin min serê xwe bilind kir yêkî rêdîn dirêj hindî fîlekê ye.

Got ma ne remezana mubareke?

Migot belê,

Go tu çima cigarê dikêşî?

Migot te çi?

Got hûn devrimcî (şorişgêr) hemû kafirin! hûn wirra dikin û xelkê dixapînin! û gelik
xeberê bê rêz gotin.

me qet nedixast navbera me û zîndanîya de tiştekek nexweş biqewime û tiştekek din li
perwenda me zêde bibe.

Hindî min dengê xwe nevî dikir bi nermî û nesîhet ewî dengê xwe bilind dikir û
zêdetir bê rêzî dikir. Me hind hajê bû hevalekê patka wî re girt û kire hewr hevalno
ewa ceş û mîtê tirkoye wernê. Ez bêjim deh hûn bêjin sî heval lê xir bûn rakirin ser
destê xwe tûka wî hemu werrûn û şilukut kirin.

silêman hat got te çi kirîye tu çire nasekinî ...tu nizanî ewa bo me baş nine?

Me gote hevala berdî çilê nayê wê carê jî çi nebêjinê.

heta roja em zîndanê de bûn ewî bisilmanî eger rojê çend car ez dîtibam silav dikir û
xwe diçemand. Topiz li biheştê hatîye. Bi rastî eger tirs û xofa kesên şorişgêr bi
xasmanî pkk neba wan îslamîyên ifratî yê rojane kesên muxalif dabane ber kêra û dev
difnê wan birrîbana.

Carekê ez qata sê yê ser textê xwe hatme xwarê li bin textê min qata dûyê yêkî lawaz
û devuçav pîs ifratî ku nedikarî nav çavê me binêre bi navê îzet xoca (mela îzet) hebû
ku xwîşka xwe kuştibû ketibû zîndanê. Xwîşka wî bi salan pêşde gel yêkê bi dilê
xwe, xwe dabû rewandin du zarokê wê jî hebûne wî mela îzetî lêdabû kuştibû. Ewî
kitêbek dînî dixand.

wextê ez ser text hatim xarê pêyê min kitêba wî ket min sed carî daxwaza lêburînê kir gotê bibexşe bi nezanî çêbû lê ewî digot na te bi qestî lingê xwe lêda, eger li tirsê hevalên şorişgêr neba ezê dabame ber niştera ku wan li zîndanê de çêdikirin.

Wekî min pêşde jî bas kiribû karê me yê rojane rabûn rûniştin gel kesên welatparêz bû me qise dikir basa rûdan û bûyera dikir.

hewşa zîndanê da meydana walîbalê hebû ya rastî me her çara jî baş nedileyîst lê xelkê zîndanê xurtên bajarî têde bûn gelik xweş dileyîstin.

du apên bi temen û dewlemend jî bi navê yêkê apê mihemed xan û yê din jî apê henîfî hebûn ku wan jî xwe nedileyîst lê zengîn bûn her yêk dikete alîkê yanî şertî dileyîstin û kê biriba tîma din êmîş, şirînî, nûşabe, ça û ... hemuya re dikirîn.

Ew du xalên rêzdar gelik nirx qîmet didane me her çara gelik keyfa wan me dihat û ew leyîza şertî jî zêdetir ber xatra dilê me dileyîstin ku tama devê me xweş bikin. Ser mesela sîyasî nehatibûn girtin lê kurdperwer û welatparêz bûn wextê ketibûn zîndanê nav koma heval û şorişgêra hema xenî bibûn.

Çend heyvek li zîndanî bûna me li dîyarbekir derbas dibûn rojekê me dît sê hevalên me yên pêşmerge bi navên 1.Elî Elîzade 2.Mehkûm Cebarî 3.Mam Ebûbekir (riha wî şad be) jî anîn bal me.

Em ketin pirsyar kirinê û bas xeberên hizbê û hevalên xwe. Kongira heştê hatibû girtin gelik guhertinên kûr çêbibûn.

Çend endamên rêberîya hizbê cuda bibûn hizbek din ava kiribû rêjeyek berbiçav kadir û pêşmerge tev xwe biribûn navê hizba demokrat_rêberîya şorişgêr li xwe kiribûn. Weke min berê jî gotibû kekê Silêman radio'yek panasonic hebû me guhdarîya radio dengê kurdistana îranê dikir û me ew nûçe bihîst û navê kesên cuda bûyî zanî.

Li melbenda şomalê 4 kes rêbertîya hizbê de hebûn ku sê kes gel wan çobûn Elî Kaşîfî, Ismet Ebdî, Şapûr Şucaîfer ... lê Mehmûd Deştî mabû.

Bi xweşî we pêşmerge zêde gel wan neçobûn min zêdetir pirsar du kesa dikir kekê Evdila û kekê Rehîm Salihzade, sala 1997 wextê ez bi penaberî hatime Norwêjê min her du dîtîna û bi dîtîna wan şad bûm.

Hizbên sîyasî û şorişgêr bo azadî û bi dest anîna mafê mirovan şer dîkin bê goman wan hevalên me jî mafê wan bû ku bîrboçûnên cuda cuda hebin bêjin û bo kar bikin. Ixtilafî nezer tiştêk asayî ye ixtilafî selîqe bê goman asayîtîre çon her serek aqilek û her kesek wek xwe reftar dîke lê hizbên sîyasî û xasmanî hizbek ku di halê şer û şorişê de ye dibe cudabîrî ser têz teorî û fikrê be reftara cuda jî ser taktîk û şevazê xebatê be lê mixabin hingê jî û niha jî bo min her tim pirsyar buye û heye ka wan hevalan ser kîjan têz û teorî yan taktîkê bi sikirtêrê wî çaxîye hizba demokrat cangorî doxtur Qasimluyê mezin re li hev nekîr yan bal rêberîya şorişgêr kîjan sîyaset û taktîka poxt û patî hebû ku bal cotê cangorîyan qasimlu û şerefkendî çinebû?

Rojek li wan roja cejna serxwe bûna turka bû serok wezîr Turgût Ozal birya dabû zîndanî bi wê munasibetê milaqata huzûrî gel malbat û kesukarê xwe bikin. reyîsê zîndanê ku kesek faşîst û bê wijdan bû zîndanî hewşa zîndanê de kom kirin û axivî. Got we gireva bîrsî bûnê girtibû negudarî kiribû lema ez îzin nadim ew milaqata huzûrî pêk bê, zîndanî hemû perîşe û bê keyf bûn çon kesê wa têde bû bi sala bû kesukarê xwe nedîtibû ber hejarî dûrî deskurtî û rebenîyê qîsa reyîsê zîndanê hemû xemgîn kirin ser de jî gef xwarin eger hûn tiştê wisa dubare bikin ezê xirabtir bi serê we bînim.

Wê heynê de gencek ku navê wî jî Şêxmûs bû kûditaya 1980 de çar salan hatibû girtin her du milê wî bin şikencê de hatibûn şikestin û niha jî girtîyê sîyasî bû bi dengê bilind bangî reyîs kir û got ew milaqat bi destûra serokwezîr seranserî zîndanên turkîyê de birêve diçe û heqê te nîne tu wî mafî ji malbata û zîndanîya bistînî. Ez te agadar dikim bi hestên xelkê re neleyîze dibe ku destê me bo tolhildanê kurt be lê derweyî zîndanê ew maf parastîye û em te xweş nabin.

Reyîsê bê namûs û faşîst nav wan hemû zîndanîyan de nekarî qebûl bike lê piştî sê roja gefa hevalê şêxmûs karê xwe kiribû milaqat birêve çû û kesek jî bo milaqata me

hatibû ku ji aliyê berpîrsê nû yê melbenda şomalê kekê Têmûr Mistefayî we hatibû şandin.

Ew kes gundîyek bakûrê kurdistanê bû ku me berê hevdu nas dikir û bi dîtina wî em gelik şa bûn û me zanî ku em bîr nekirîne.

Sala 1365 em hatibûn girtin û wî midetî de tenê carekê li zîndana Gewerê kesek hatibû dîtina me piştî me çî xeber û harîkarîyek ji xudan kursî û berpîrsên hingê nedît û xuyabû mijûlî pîlan paye û kongira 8 bûne.

Wî kesî em li bas xebera agadar kirin bi taybet got hizbê û serweyî hemya doxtur Qasimlu hûn bîr nekirîne, ew xebere xweş bû û hinek jî xercî bo me anîbû ku hizbê şandibû.

Roj, heftî, meh li pey hev derbas dibûn û dema dadgah bûna me jî nêzîk dibû.

Hevalên şorişgêr li hemû hizbên kurdî di zîndanê de bi taybetî pkk nameyek ser rewşa me ji baro'ya Amedê (sendîkaya wekîl û mafnasan) re şandibûn û nivîsîbn çar pêşmergeên hizba demokrat a kurdistanê îranê wira cem me girtîne û hewceyîya wana bi hewkarî û wekîlên welatparêz heye, û daxwaza me ewe hûn jî erkê xwe yê kurdayetîyê bicî bînin.

Min çendîn car wan postên derbas bûyî de hest û hurmeta xwe hember gelê me yê bakûr, azadîxwaz û welatparêzîya wan paye bilind anîye ziman hetanî ez sax jî bim ezê minetkar û qedirzanê wan bim. Em girtî bûn tenê û bêkes bûn lê wextê em ketin nav rêz û refa wan çelengên niştîman bêhna me fire bibû em bibûn xwedanê kesukar û xizm û xalan. Ya ji destê wan dihat bo me dikirin û gelek jî rêz li me digirtin û li me dibûne xudan.

Roj hat û em birin dadgahê û me dît wekîlek gelek hêja, xweşik xweşpûş û şarezayê karê xwe difa ji perwendê me kir û got : ewane weke pêşmerge û çek bi dest şerê eskera nekirîne û çekê xwe bê deng kirîne û davîyê jî teslîmî eskeran kirîne ew jî nîşana wê çendê ye ku nîyeta xirab û pevçûnê çinebûne û kêmtir li kîlometrekê jî

hatine nav xaka turkîyê û paşê bi xalên qanûnî û huqûqî pêde ço û bersiva hakim û dadgahê da.

Ew wekîl navê wî Erdinç uzunoglu xelkê bajarê Farqînê kela xweşmêr û egîda, û birayê mezin yê xebatkarê navudeng û dostê dr. Qasimlu rêzdar dr. Yekta uzunoglu bû ku mixabin kekê Erdinç par ço ser dilovanîya xwe riha wî şad serê dr. Yekta û malbata uzunoglu gelê kurd sax be.

Weke min berê jî bas kiribû fermanê wê qerequla ku em girtibûn em nas dikirin û gotibû ezê raporta girtina we bi başî binivîsim û rastî jî wisa bû lema parastina kekê Erdinç jî hinekê rihet kiribû.

Piştî dadgehê em zivirandin zîndanê dost û hevalên hewsê hatin pêşwazîya me û pirs kirin ka netîce çi bû?

Me got em azad nekirin lê ewan wekî her car dildanî dan ber dilê me û em dilxweş dikirin ku hûnê bêne azad kirin.

Di nîveka heyva heştê a zayînî em bo cara duyê xwestin bo dadgahê ku dîsa rêzdar Erdinç uzunoglu wekîl û parêzerê me bû. (Nûr gorra wî bibare û riha wî şad be)

Paş xwendina nav û şecera me wekî her car em gazî kirin bi turkîya xwe nav û şoreta me ser hev de nedi'anîn ez û fadil hemîşe pê dikenîn fadil digot du sale em girtine hêjî nikarin navê me bêjin xwedê heta fêr dibin emê pîr bin.

Savcî navê me xwand dîsa basa sûçê me kir ku çar kes bi wan navane û bi çek bi avayek neyasayî û neqanûnî 500 mêtêr derbasî nav xaka turkiye cumhuriyetî bûne wextê digihîşte wê 500 mêtêrê me jî bi henek digot tu jî were çend kîlomêtra topraxa me basmîş ke welehî em tiştekekê nabêjine we!

Mamosta Erdinç bi sakoyek dirêj yê wekaletê serxwe û ser hemdê xwe bi hin xal bend û tebsereyan bersivek yasayî û huqûqî da û pêde ço got ber wan xalên ku min bas kirî û hatina wan bi şaşî û ne bi qest bûye ez daxwaza azad bûna muvekilên xwe dikim. Fermanê qerequlê jî raporta xwe de nivîsibû ku şevêk tarî û zîlmat de ketibûn topraxa me dibe ku rê inda kiribin

Ya rastî ser sînor çi xetek sînorî nehatibû kiviş kirin raporta qerequlê jî bi erênî hatibû nivîsîn. Kek Erdinç jî davîya axivtina xwe de got gorekî xalên yasayî eger sûçê wan jî hebe wî heyamê du sala cezayê xwe kişandine û ez li hakim û savcî daxwaz dikim muvekilên min berdin.

Em her çar bi destên kelepçe kirî ser pêyan û bê deng sekinîne qurte qurta gewrîya me ye, em çaverê û bendewarin.

wan heyaman de tirsê me ya dîke jî ew bû piştî azad bûnê yê çi li me bikin ka yê me bişînin cîyê me yan me radestî rijîma îranê bikin? Min bi xwe xewin pêwe didît ku me tehvîlî îranê bidin ew tirs li hizir û wicûda mede hebû.

Piştî axivtinek kurt û manedar û bi nawerok hakim û savcî rabûn çone derweyî dadgayê çone odeya din û paş çend deqîqa zivirîn û cihê xwe de rûniştin. Em ne bi çavekê belku çendîn çava ziq mane û devê wan dinêrin ka yê çi bêjin?

wan du sala em gelik caran biribûn dadgahê lê ewa cara yekê bû ku hakim û savcî bo rawêj û meşweretê diçon odek din pêş hukmê girtina me dirêj bikin. Em req û hişk ser lînga sekinî bûn ka çarenivîsa me çîye? wekîlê me munşî û yê din rabûn ser xwe her du bi îşare li hev nêrîn yek ji wan dest bi axivtinê kir hindek bend û xalên yasa û rêsayê rêz kirin û hukmê azad bûna me xwend.

Bi rastî hêsan nine mirov bikare hest û halê me yê hingê û keyfxweşî û dilşa bûna xwe bi nivîsê bîne ziman û wê hestê bo xwînerên xwe bas bike. Niha ku gelik sal ser wê bûyerê re derbas dibin dîsa keleşan û heyecan min digre dilê min tijî û girî gewrîya min digre.

Li dîyarbekir du zîndan hebûn weke hemû şarên mezin yêk zîndana ku em tede bûn pirranî kesên ku hêştê hukmê wan dîyar û zelal nebibû û kesên qatil û xwedî cezyên civakî tede bûn yêk jî zîndana girtîyên sîyasî ku tîpa E bû ku me hez dikir nav wan de

bin lê çon hêşta cezayê me eyan û beyan nebibû em jî zîndana kêleka kelê de xudan dikiran.

nayê bîra min ku mecal dabine me, em sipas û qedirzanîna xwe pêşkêşî mamost Erdinç uzunoglu bikin. em wegerîyan zîndanê wekî min pêşda jî îşaret pê kiribû sê hevalên me yên dinê jî anîbûne bal me, ew jî çawerê bûn ka netîca dadgaha me çi lê hat? Ji ber ku qedera wan jî wek ya me bû lê li me kêmtir tecrubetir û bê zimantir bûn wan pê wa bû eger me azad kin ew jî azad dibin.

Her wisa pirranîya dost û hevalên ku şev û roj em bi wan re bûn çawerê me bûn. Carên pêşde her li dadgahê de digotin ku celesa din ya dadgahê filan tarîxê de ye lê wê carê negotin û hukmê azadîyê dabûn û em keyfxweş û dev biken bûn lema gardîyan û nîgehban jî pê hesîyan ku em azad bûne.

Em derbasî hewşa zîndanê bûn bi rûyê me yê geş û xweş re hevalên me yê zîndanê jî pê hesîyan ku xeberek xweş bi me re heye bi çepik û şadî û dua pêşvazîya me kirin. Hevalên welatparêz û şorişgêr ewên partîyên xwe de paye bilind bûn weke Selanîk Omer şaredarê qiziltepe yên ku baro û sendîkayan de kar dikiran gotin ka em çi bikin ji bo çarenivîsa we ya piştî zîndanê çon metirsî û nîgeranîya tehvîl dan û radest kirina me bi rejîma îranê hebû.

Hemû ew kesên min serwe bas kirin û hevalên PKK ku îmkân û deshilatên wan pirtir û zêdetir bûn gotin em çi bikin çi ji destê me tê em encam bidin?

Ewan bixwe ew cî û kesên ku hewce bû weke baro, nûnertîya partîyên xwe li hundur enqere îstanbul û derweyî welat, sendîkaya mafê mirovan li kurdistan û turkîyê bi qasî karîn û îmkânên xwe agadar kirin û anîne ser xet ku bûyerek wî rengî heye çar pêşmerge girtî yên HDKÎ azad bûne û ihtimala radest kirina wan heye dibe ku li rêya dîplomasî û pêwendîyên sîyasî em rê li wî karî bigrin.

Em hatin agadar kirin ku sibê yan dusbe hûn li zîndanê azad dibin dema ku polîs hat me bibe hemû ew dost bira heval welatparêz û şorişgêrên wan sê benda ku şev û roj pêkwe borandibûn bo rêxistin û xatir xastinê birêz û ihtiram sekinîbûn. Wan ezîz û

mêrxasan hindek pare jî navxwe de kom kiribûn bo hewceyîyên me yê rêkê û xwe derbas kirinê.

Hevalên wan sê bendan hineka bi kenî hineka bi girî û dilek şevitî hindeka bi silogan û şuarên şorişgerî destê xwe li me bilind dikirin maç me re dişandin. Hevalên wan sê bendên din ku me hevdu nedidît bi dengê bilind silogan didan û bangê me dikirin hevalno sefera we ser xêrê be oxira we bi xêr be bi keyfxweşî diqîrandin.

Menzere û dîmenek balkêş û dîrokî nû di gelik alîyan da zîndana dîyarbekir bibû xala werçerxanê xebatkarên du perçên kurdistanê bi hestên netewî û biratî bi hew re girê dabûn. Tevî ku em her yêk ji partî û alîyek sîyasî yê cuda bûn îdeolojî û dinyabînîya me xebatê de cuda bû heta em reqîbê hew bûn sîyasetê da lê kurdistan kurdayetî û hedefa hewpar û hewbeş em pêkwe girê dabûn û ew dîmen û hestên dîrokî afirandibû. Piştî heyameke dûr û dirêj ku em bi hesreta azadîyê bûn em azad bûn lê dûrî li wan hevalên hinde egîd û ezîz em tûşî nakokîyek derûnî û bêhnçikîyê kiribûn ku em wan cî de dihêlin ya ji wê taltir û nexweştir cî de hêlana sê hevalên me yê pêşmerge bû mam ebûbekirê kalemêr û mezlûm sadiq sade û du hevalên din.

Hemû hêvî û daxwazîya wan sê hevalan ew bû dema ku em bi silametî derbas bûn ya ji destê me tê bo azadîya wan bikin.

wê carê beruvajî carên din eskerên xwînmij û bedreftar nehatibûn pêşîya me belku polîs hatibûn me derbas kin. Çavên me wekirî û destên me kelepçe nekiribûn. Şalek kurdî pêyê me de kirasek jî serde me wegirtibû.

Kele kela germa havînê ye li dîyarbekir hêk ber tavê diqelîya, rast em birne emnîyeta amedê, em qederekê rûniştin gazî me kirin bo cem patron (reyîs polîsê amedê)

Em her çar bi rêz û dest berdayî bi nîşana rêzgirtinê sekinîn. Bin berçavkê xwe de me nêrî û bi tirkî û farsî ku nedizanî lê bi qestî navên me tevî hev fikir gazî yêk bi yêke me kir yî bejin û balê me kir.

Hinek kaxez li pêşîya wî bûn ku ihtimalen nav û xulasa perwenda me bû.

Bêhnek kûr û dirêj kêşa û got :

_ iranli misiniz?

+evet

_Fars misiniz?

+ hayir fars degiliz

_ Ermeni misiniz?

+ hayir ermeni degiliz

_Turk azerimisiniz?

+hayir

Ewî baş dizanî em kîne lê zimanê wî nedigerîya navê kurd û kurdistanê bîne.

_ Ê peki ne bok misiniz?

+ biz kurduz

her wekî te tijî nav çavê wî tif kiribe yan çekuçek ser enîya wî dabe got :

A..na koydugumun oruspu çocugu, buraya adam gelmiyor ki

Reyîs polisê faşîst û nemirov ji me pirsî:

_ hûn dixwazin çi bikin?

+ em dixwazin herne nav refa hevalên xwe.

_ hevalên we kîderê ne? Adrêsek cihek kivşkirî heye?

+ her li wî cîyê ku em hatinî girtin me li wê derê azad kin lê me radestî îranê nekin.

_ ez nizanim ezê we teslîmî wê derê bikim ku hûn girtibûn wir wê de ez nizanim.

Nav çavê me nêrî got : hûn gencin û taze pêdigîjin çarenivîsa we maluhalê we yê çi lê bê? Ezê we teslîmî UN'ê bikim û bibim alîkar ku hûn herne avrûpa , hûn hem bi sax silametî diçin hem jî ku we xwast wegerin wî cihî hûn dikarin.

Migot silêman em bi gotina wî bikin ji ber ku em nizanin ka yê me tehvîlî îranê bikin yan ne? ew rîska yê ser jîyana me rabe. Fadil û Mêhran reî û dengê wan momtenî (ne erê ne jî ne) bû, çavê wan li devê silêman bû meger min nêrînek yan tişteke gotiba.

Silêman got ne emê wegerine bal hevalên xwe û êdî cîyê zêde pêde çonê nebû welhasil.

Me got her ya me berê gotî û me bidin wî cîyê ku em lê hatîne girtin.

Paş nêzîk sietekê gazî me kirin haydi yalla gidelim.

Şalê kurdî û kirasek ber me de me rûyê xwe tiraşîye em siwarî docekî polîsa kirin heta têrmînalê Amedê ku me bibin colemêrgê.

Li têrmînalê çar polîs bi kincên sivîl bi me re man çar polîsên genc bilind bernavmil û rûxweş, em bi hewre dibêjin dikenin basa jîyana îranê turka û zîndanê dikin.

Ser hesaba me heşt bilît kurrîn em siwarî otubusê bûn pêş ku em rê kevin migotê ez dikarim ser avek sivik bikim? Bi îşareta dest WC (twalêt) nîşanî mida ez çom zû jî derketim midît koncîkê twalêtê de yêkî pîr ku zarokek 11/12 salî jî bal bû bi devuka tirkî ya dîyarbekir gazî min kir :

_ Yav nêreye gidiysen qerdeşim parani ver para!

Ez zivirîm û mi gotê

+ ez du sale hewsî me ez kurdim parê çî mala te ma çirre mîzekê jî pare divê?

Min bi kurdî wan re qise kir ew kurkê 12 salî xwe nêzîkî babê xwe kir got :

_Bavu adamin kafasi bozuk ya birak gitsin!

Ez bi xwe kenîyam û migot hûn heqin ma hûn min çî nas dikin?

Em siwar bûn bo bajarê Wanê û li têrmînalê peya bûn em bîrsî bûn me tişte ser pêya xwar ez bawerim polîsa ser hesaba xwe xwarin û siwarî otubusa Colemêrgê bûn tiştê ku balkêş bû em çar pêşmerge bûn çî carekê jî wextê esker û polîs dihatine nav otubusê bo arame û kontîrolê kimlik li me nexwestin ew jî ber wan çar polîsên sivîl bû ku gel me bûn lê em pê nehesîyan ka ewan çawan hemahengî dikirin û pê dihesandin.

Em êvarek direng ya rojên havînê û gelik westîyî gehîştin colemêrgê alîyekê keyfxweşin ku piştî nêzûkî du sala azad bûne û qeydubendê zîndanê de ninin li alîkî din hêştê tirs û nîgeranîya tehvîl dana me bo îranê nav diluhinavê me de diqilqile, em rast birne emnîyeta colemêrgê. Colemêrg hingê biçûk bû singê çîya de ava kiribûn navê wê ji çole mêrgê hatîye girtin (min wisa bihîstîye) berda jî cadeyek kevin û bê seruber hebû çemek mezin binya bajêr re derbas dibû cihekî xweşe bi cografiya û

erdnîgarîya xwe lê li ber sînori bûn û stratêjîk bûna wê di warê nizamî de ez dibêjim bi qasî xelkê bajêr hêzên leşkerî û emnîyetî yên tirk jî têde hatine akincî kirin.

Avayîyê emnîyetê ez bawerim bilindtirîn bîna bû wî çaxî û em birne qata jêr erdê (zîr zemîn) odek 2×3 derek sor û kevin û jengî hebû ez bêhnê nizanim ema gelik pîs pintû sar tijî mêş û moz bûn cihê beşera nebû.

Piştî niv sietê herekê me petûyek reş eskerî danê hinde zivir û pîs bûn te digot qîfarên kone kutrêne bedena mirov de diçin.reflara wan hinde car baş bû em keyfxweş dibûn lê hinde car jî wekî se xwe delinga mirov didan

Cezayê me nemabû ema rabûn rûniştina esker û polîsan weke roja ewilî em girtî wisa bû, em sê şeva wê cehnemê da xudan kirin me kiras û derpêyên xwe kiribûne kîfdestîkê de me didanî ser solkê xwe weke balgî lê istifaade dikir bo razanê.

Piştî 4 rojan polîsek hat derî wekir got patron (reyîsê emnîyetê) we dixwaze. Silêman tinê çu em her sê mane çawerê hatina silêman. Ez û fadil zarokê cihekê û ji dayîk bûyê salekêne lê ya rast fadil hemîşe wek birayê mezin ihtirama min digirt û qise xweşe jî bi taybet eger yêk hebe bide qise danê û pîz bike ew jî karê min bû me yarî bi Mêhran dikirin me digotê eger em bizanin emê te bixeniqîn wê belayê xilas bin :)))

Paş qederekê me dît silêman ewe hat lê bi tûk û xolkek şîn me jî fikir kir xeberek xweş bal heye bi qewlê gotî dixwaze me surprîz bike çon min silêman û fadil hingê jî niha jî gelik şoxî bi hewre hene me got dixwaze me surprîz bike lê em fetisîne, nexêr car bo carê silêman zêdetir duşmîş dibe destê xwe danîye ser cênîka xwe axerê got ez bêjim yê me tehvîlî îranê biden.

Me pirs kir ka bêje çi got? Be te çi gotê ewan qewil dane me nedine îranê ...

Got êdî dema gotina me xilas bû , midûrê emnîyetê gote mutercim!

Midûrê emnîyetê û mutercim basa hewdîtinekê gel rayedarên merzî yên îranê dikin û dibêjin ew hewdîtin yê sêroyê bixwe de birêve biçe an qapû de?

Xêncî perwendê me ewan qerarê çavpêketinê bi hewre hebûne silêman jî wisa halî bibû ka yê me tehvîkî qapû bidin yan Sêro yê? Û niheq jî nebû ...

Gotinên silêman tevav bûn çî hiş û hedan serê me de nema, me derî kota kire hawar polîsek hat got çî bûye çî qewimîye?

Min got hûn dixwazin me tehvîlî îranê bikin we qewil û soz daye me hûn bo çî wê yêkê gel me dikin? Me gotîyê we em yêkudu bixendiqînî jî em nahêlin hûn me tehvîlî îranê bidin.

Got ne tişteke wisa çîne ..

me got em dixwazin reyîsê emnîyetê bibîn got başe.

Paş çend deqîqa hat, bîra min nine em hemû çon yan bi tenê?

bi kurtî midûr û reyîsê MIT a colemêrgê ew çavpêkevîna bi rayedarên îranî re çî peywendî û irtibatek bi we û perwendê we ve çîne ewa ku min û mutercim ser qise kirî tişteke dine û hûn şaş lê halî bûne qewlê mêra ez we radestî îranê nakim her çend gelik we li me daxwaz dikin.

Reyîsê emnîyetê got ezê bixwe gel we bêm heta wi cîyê hûn dibêjin. Nîvro hat got eşyalarinîzi toplayin em siwar kirin bo gewerê. hindî em ber bi sînor dibûn omîd û hêvîya azadî û hilmijîna ba û hevayê azad yê kurdistanê zêdetir bêhna wê li me dida lê hêştî jî em sedî sed xwe bawer ninin çon çî deshîlata me çîne.

em birne gewerê hewşek mezin xuya bû bînayek dewletîye.

Bi salan piştî wê bûyerê, bo hewdîtin gel rayedarên eskerî rêya min kete wê hewşê û bînayê û min hingê zanî ewa tabûra gewerê ye.

Em wira jî birne bin erdekê ku sed rehmet li silûla emnîyeta colemêrgê çon tinê miş mar û dirrinde dikarin tê de îdar bikin gelik pîs gemar û tengav bû.

Fadil nizamî li ber xwarinê yan xwe dirêj kirinê ser sîman û bêtona tezî zik êş û îshal bibû. Twalêt bin erdê de bû der jî ser me de girêdabû me hindî kire gazî kesê cevaba me neda fadil zik lê diço ez mecbûr mam min kîfdestîya xwe xalî kir da fadil û migotê kerem ke te re twalêt :)))

Piştî şev û rojekê kirne gazî me eşyalarinîzi toplayin me jî tiştê xwe tev pêçan. Ka îca bera me yê bidin gelyê dirya yan şemzîna?

Wextê em amedê azad bûn li me pirsîn ku em li kîjan mesîrê we azad bikin?

me got wargenim û kendalok an jî nêzuk duguhê kuran û bilindbasanê.

Lê xetê ewil hêsantir bû bo wan qerequla Alyawa. Em li maşîna nêvekê siwar bûn maşînek paş me yêk jî pêş me diçe bera maşîna kete bin ewrazîyê ku ser dikewe hindayî hirmîyê belê 50% em erxayînin ku berew azadîyê we diçin û piste pistê dikin dikenin û ...

Em hatne nav alyawa û qerequl xuya kir ku êdî me baş naskir.

li qerequlê bihurî rast çu bo milê çepê ku diçu bo gundê dêrê ku paygaha îranê lêbû!

Me hev rênî kuro ewa çîye kîve dihajo?

denge denga me ewan jî li me nêrî gotin çîye?

Me got hûn xelet diçin derca bêsim kir bo maşîna pêşîyê gotê oglum yalnîş gidiyorsun.

Maşîn zivirandin li çemê binê raza bilind û sor derbas bû bera xwe da kendaloka rengîn min dilê xwe de got oxêş.

Êdî temame lut luta me ye mişk ser simbêlê me direqisît û sêvek xelatî naçe devê me de heyyyyy azadî tu çend ezîz tam û tevaşî.

Bi rastî ne tirs eyb û kêmasîye û ne jî giryan, ez niha jî ditirsim û niha jî gelik caran digrîm bi xasmanî dema ku tenê dimînim hûr û gir dikim pêre diçim û ...

Em hatine rasta gundê kendalokê milê çepê ku çemê li wargenima tê xwarê razek mezin lê heye ku gelik bilind nebû dema xwe de hevala bo wergirtina gumrikê hem jî weke senger û serpenah bikar dianîn, çavê min kete Qasim bendeyî fermande û pêşmergê dêrîn ku bi tenê li wir bû nizanim kesekê bû yan çi karê wî hebû?

Me gote polîsa aha ewe berpîrs û mesûlê me ye me tehvîlî wî bide.ez li maşînê peya bûm bêsekinîn çome bal qasim wî hindek xwe parast ku lazim bû wisa bikira ji ber ku sê maşînê eskerî li rasta wî sekinîbûn heke kesek din ba renga eksulemelek din nîşan daba lê Qasim hinde cesûr û mêrxas û netirs bû ku bi mêranî sekinî weke pêşmergeyek qehreman tirs li xwe nîşan neda.

Min xwe çem da û ez çome bal min silav lêkir destê wî girt em çone seruçavê hev maç kir. Bi her halî min gotê keko em li zîndanê azad dibin ewane dixwazin me

radestî hizbê bikin me jî gotîye tu femandê me yî were pêş bi mêrxasî me tehvîl wergire ewî jî bi mêrxasî qebûl kir bi azerî û turkî gel polîsa qise kir û em tehvîl wergirtin. Me û mît başkani xatir ji hev xast ew çone ser karê xwe em jî azad bûn ser xaka xwe.

Me dizanî ku kek Qasim bendeyî bi hindêk sedema niha pêşmerge nemaye lê ew kêma lutfî û sîyaseta hindêk mesûl û deshilatdarên xwerazîyê hizbê bû ku ked xebat û rola kekê Qasim ji bîr dikin nexo Qasim heta roja mirinê jî femande, qehreman û bi dil û cerg bû sedan carî çobû mirinê lê sax wegerîyabû.

Em hêştî bi temamî çem derbasî nav xwelîya rojhilat nebibûn dengê girre gir û teqe teqê hat nebêje hevalê me yê ser gumrikê em dîtî bi nîşana keyfxweşîyê teqe kirin. daketine bal me Rostem zirengî (riha wî şad) Ferzo hemudî (lenet lêbe bû çax û hat topandin)

Em rast çone wargenima û heval li me peyda bûn.

Kadrê herêma tîrgewer cangorî Kamil îbrahîmî , kek Cefer mehmûdpûr, Kek Kemal şerîfî , û xebatkarê netewî û egîd kekê NEWROZ ûpêşvazîya me kirin em bi hewre xweş û şad bûn çone serê hev û hesreta me ya du salî bi davî bû. Me li gund nan û çayek xwar û em hilkişîyane çîya û rast çone ser serê kone kutrê çadîrek wedabûn bo yêk du birîndara kekê Fetah jî wê derê bû bo peywendîyên bêsimê û rehmetî mam Hemîd (riha wî şad be)

Em her çar bê çekin kekê Newroz me diparêze şevê balxwe nîgehbanî danî bû hat bal me xwe kire nav kîsexabê de bin çadirê:))) keprek jî weke aşpezxane ava kiribûn.

Me got kekê Newroz be kê nîgehbane?

Got min dohîn danîye ser agir heta nehê nexo xew çavê mam Hemîd nakeve û yê hişar bimîne xema nîgehbanîyê nexon :)))

Paş du sê roja kek Newroz gel me hate nav hindêk reşmalên warê kemal, me firavîn xwar em hatine derê cigarekê bikêşim em bê çek bûn dayîkekê ji kekê Newroz pirsî ewane kîne bo bê çekin?

Kekê Newroz jî bi zimanê xwe yê şirin û devuka xwe ya teybetî em dane naskirin û gotê : Dadê bi keda xwe bi rûnê meşkê bi destên xwe yên daykanî kadeyek mezin û bi dilê xwe bo wan kurrên xwe bipêje bo taştêya sibê.

Dadê jî pêşnîyara kekê Newroz qebûl kir got serçava kadeyêke dilê hingo dê bo hingo pêjim. Hind pê neço xeber hat ku kek Têmûr gotîye bila bêne bêsîmê bo xêrhatin û ehwalpîrsînê, ku min îşare kir li kone kutrê bû,

Me debîya hêşta hewa ronî nebûyî ewraz ser ketiban. Em li bin reşmala bûn şefeqê zû em rabûn herin , kekê Newroz nerabû gel me bê, me got yanê em tenê herin? Got erê, migot dadê kade patibû bo me, got ezê razê ser hemdê xwe rabim kada xwe bixom paşê bêm!

Ez hêdî çome min dadê peyda kir û gotê em dibe zû biçin heke kada te bo me patî bidî me emê herin.

Got serçava kurrê min min hez dikir hingo pê mast xariba min got destê te neêşe bo zehmeta te, kade danî nav laylunekê da destê min.

Min kada xwe hilgirt û tenê jî fadil min pê hesand me da ewraz em serketine serê milê min temaşe kir kekê min rabû çu ber derîyê mala dadê hinek sekinî û berê xwe da me xuya bû çu gotê min destê xwe lê hejand :))) em dûr bûn nedigihîşte me.

Roja paştir kek Ehmed Bendeyî em mêvan kirin li konekutrê konek wedabû.

Kekê Hemze reşîdîyan û rehmetî Tahir heto jî wê derê bûn dixastin biçne avrûpa.

Xwîşka Perî reşîdîyan jî wê derê bû ku cara ewil bû min didît û bi kekê Hemze re zewicî bû.

Roja duyê kekê Mehmûd deştî em mêvan kirin li kîvaristan, xwîşka mexmer hatibû çadirek nav malên xanegê wedabû.


piştî nan xarinê ez û fadil derketin bo cigare kêşanê me dît destê Arizû û Rizgar de xurme heye fadil got serê wî çîyayî xurme hinde xoşe!

Mexmerê bihîst got ay ez dê noke bo hingo bînim fadil got ne xudê lazim nîne feqet didanê min dêşe migot ez hîke xurma bixom didanê min baş be :))))

di halekê de xurme qatîlê didane.

Bîrewerîyên xwe yên zîndana dîyarbekir wira de bi davî tînim hivîdarim bi dilê we hevalên delal û dilsoz be. Temen hilkişîyaye gelik tişt bîra mide nemane gelik tişt jî bo gotin û nivîsînê nabin daxwaza min ewe dilê çî hevala neêşabe û ez dîsa dibêjim me bo bidest anîna maf û azadîyan xebat û şoriş kirîte ku mafê azad nivîsînê û bîrura derbirrînê yêk ji wane.

Carek din hemû heval û hogirên xwe yên çeper senger zîndan û awareyîyê bibîr tînim bejna xwe hember xwîna şehîd û cangorîyên kurdistanê malbatên wan û pêşmerge, gerîla, şervanan diçemînim.



Em di 8/8/1988 bi fermî hatin berdan, anku hewsa me bi davî hat.
